Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1100 | 17-Îlon- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Çîroka Wehîbe ya ku xewna xwe veguhastiye rastî

**Wehîbe piştî kedeke mezin xewna xwe pêk anî û dîwana xwe ya yekem bi zimanê Kurdî bi navnîşan "Êş û kul ji kaniya dil" çap kir.**

Di mala xwe ya biçûk de, Wehîbe Îsa tevî lênûs û pênûsa xwe dest bi nivîsandina helbestên bi zimanê Kurdî dike.

Wehîbe Îsa (55) ya ji gundê Qelan ê navçeya Dirbêsiyê ya kantona Hesekê, dayîka 4 xort û 4 keçan e. Ji bo pêkanîna xewna xwe ya zaroketiyê – nivîsandina helbestan bi zimanê Kurdî kedek e mezin dide.

min di şahiya Newrozê de xwendiye û tê de nameyên siyasî yên ku siyasetên hovane yên hikumeta Şamê rexne dikirin, lêpirsîn bi min re hat kirin." Wehîbe diyar kir ku dijmin her tim hewal dide şerê gelê Kurd bike û hebûna wî tune bike û got: "Em ê bi pênûsên xwe şer bikin û nivîsên me dê di sîngê dijmin de bibin şûr."

**Çapkirina yekemîn dîwana helbestan**

Piştî demeke dirêj û kedeke mezin, Wehîbe Îsa xewna xwe pêk anî.



Şoreşa 19'ê Tîrmeha 2012'an a ku ji Kobanl dest pê kiriye û li seranserî Rojavayê Kurdistanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyayê belav bûye, derfeteke mezin da Wehîbe ku dest bi fêrbûna nivîsîn û xwendina bi zimanê Kurdî û nivîsandina helbestên bi zimanê Kurdî dike.

Her wiha gotinên pêşiyan ên Kurdî yên ku dayîka Wehîbe berê ji cîranan re vedigotin bala Wehîbe dikişand û ji wir çîroka wê dest pê kir û xwest rêya dayîka xwe bişopîne û bibe helbestvan.

**'Şoreşa rojava xewn veguhastlna rastî'**

Wehîbe Îsa xwendina xwe ya amedehî bi dawî kir û bi destpêka şoreşê re ew ji jinên pêşîn bû yên ku dest bi fêrbûna zimanê Kurdî kirine. Wehîbe tev li Saziya Zimanê Kurdî (SZK) bû û dest bi fêrbûnê kir.

Wehîbe wiha axivî: "Roj bi roj îsrara min a nivîsîn û xwendina bi zimanê xwe zêdetir bû ku gihîştim astekê min got çi bibe bila bibe ez ji bilî zimanê xwe bi tu zimanan nanivsînim."

Wehîbe destnîşan kir ku wê nikarîbû pirtûkên Kurdî bixwenda, lê belê hevjînê wê pirtûk û kovarên bi zimanê Kurdî jê re dianîn û hêdî hêdî xwe bi pêş xist û armanca xwe pêk anî.

**ji ber xwendina helbestên kurdî lêpirsîn pê re hat kirin**

Wehîbe wiha domand: "Di sala 2013'an de ji ber helbesteke xwe ku

Di dawiya meha Tîrmeha îsal de û piştî ku wê erêkirinek ji Yekîtiya Rewşenbîran a Herêma Cizîrê bi dest xist, yekemîn dîwana xwe bi zimanê Kurdî bi navnîşan "Êş û kul ji kaniya dil e" çap kir û di wê dîwanê de 58 helbest di 114 rûpelan de hene, çepa yekem 100 pirtûk in.

Wehîbe bi rêya nivîsên xwe rastiya derdora xwe vediguhêze û ev nivîs wek gotin, qesîdeyên helbestan, pendên pêşiyan ên Kurdî ne, wek:

"Ê xwedî bîr be, wê mala wî bi tevdîr be.
Ê nizan be, wê her tiştê wî arzan be.
Emir pire û nirx kure û mejî bê tevdîre.
Erê dem bê bextelê cama dibe texte
û cama dibe rexte."

Qedîseya wê ya bi navê (Derdê min)
Derdê dilê min narin"
Li sînga min siwarin
Mil û pişt lewma xwarin
Ne pîber û pîbarin
Dost û heval ew pirin
Dora min dizîvirin
Mixabin dil kevirin
Ji bo a xwe diyarin
Ez dinalim ji dilê kewîr
Tê sînga min rim û tîr
Wenda dibe hiş û bîr
Li ser stiwê min barin
Derdê dilê min pirin
Damarê min dibirin
Sert û qesp û çi çirin
Barê kevir û darin"

Wehîbe ji hemû jinana re hêvî dike ku dema xwe li tiştên nebikêrhatî winda nekin û xwe di hemû qadan de îsbat bikin ji ber ku şoreş, şoreşa jinan e.

# Girîngiya xebata dilxwazî

**Çalakgreên jin ên li Reqayê diyar kir ku ji bo xizmetkirina civakê û avakirineke hevgirtî pêdivî bi xebateke dilxwazî heye. Jinan got fikra komînan li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê serkeftina xwe îsbat kir û divê li tevahî erdnîgariya Sûriyeyê pêk bê.**



Meclisa Jinan a Sûriyeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li ser `Girîngiya xebata dilxwazî` li hola xwe ya li Reqayê civînek li dar xist. Di civînê de endamên meclisên jinan û komînên li Reqayê, çalakgerên jin û endamên jin ên Nivîsgeha Kar û Barên Olî beşdar bûn.

Di civînê de endama Kordînasyona Meclisa Jinan a Sûriyeyê Feyroz Xelîl li ser xebata dilxwazî û wateya komîn ku nûnertiya girîngiya xebata dilxwazî di avakirina civak û xizmetkirina wê de dike axivî. Feyroz îşaret bi rola mezin a jinan a di xebata dilxwazî di dirêjahiya dîrokê de kir û wiha got: "Niha û di vê demê de divê em di komînan de layiqê xebata dilxwazî ya avakirina civaka xwe bin û hevgirtî bin."

Li ser serkeftina komînê ku şaneyeke civakî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye Feyroz wiha domand: "Jinên Siwêdayê banga pêkanîna Rêveberiya Xweser û piştgiriyê ji jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dixwazin. Ev yek nîşane ye ku fikra komînan û xebata dilxwazî serkeftina xwe di civakê de îsbat kir."

Piştre li ser rêxistinên jinan hate behskirin. Jinên beşdarî komxebatê bûne diyar kir ku rêxistin piştgiriyê di aliyên siyasî, civakî, çandî û tenduristiyê de dide jinan û wan xurt dike.

Civîn bi rêzenîqaş û pêşniyarên ji hêla jinan ve bi dawî bû. Di wan nîqaşan de hate gotin komên jinên dilxwaz werin avakirin da ku serdana kampan bikin û rewşa wan bişopînin, pêdiviyên wan bişopînin û piştgiriyê bidin jinan.

Sudoku: Bersiv 11

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 3 | 1 | 5 | 9 | 7 | 6 | 4 | 8 |
| 9 | 4 | 5 | 8 | 6 | 1 | 2 | 7 | 3 |
| 7 | 8 | 6 | 2 | 3 | 4 | 1 | 9 | 5 |
| 4 | 5 | 9 | 3 | 1 | 2 | 8 | 6 | 7 |
| 8 | 1 | 7 | 4 | 5 | 6 | 3 | 2 | 9 |
| 6 | 2 | 3 | 9 | 7 | 8 | 4 | 5 | 1 |
| 5 | 7 | 4 | 1 | 2 | 3 | 9 | 8 | 6 |
| 3 | 6 | 8 | 7 | 4 | 9 | 5 | 1 | 2 |
| 1 | 9 | 2 | 6 | 8 | 5 | 7 | 3 | 4 |

Sudoku:Pirs 12

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | 4 | | 7 |
| | | | 1 | | | | | 6 |
| | | 8 | | | 3 | 5 | 2 | |
| | 6 | 4 | | 7 | 5 | | 8 | 1 |
| | | | 6 | 3 | 4 | | | |
| 3 | 9 | | 2 | 8 | | 7 | 6 | |
| | 1 | 3 | 7 | | | 2 | | |
| 4 | | | | | 8 | | | |
| 9 | | 7 | | | | | | |

# FERHENGA BIWÊJAN

**Em bi hev re vî berî nabin serî:**
- Em nikarin bi hev re hevaltiyê bikin. Berê paleyan berikekî genim dida ber xwe bi hev re didirûtin heta dibirin serî.

**Hesinê wan ji hev nake:**
- Nêrînên wan ji hev nagirin; nikarin bi hev re hevaltiyê bikin, yan jî bixebitin.

**Ji hev nagirin:**
-Cira wan bi hev re ne xweş e; bi hev nakin; fikrê wan ne yek e.

**Ji hev naxwin:**
- Bi heman wateyê.

**Karçîna xenîqok e:**
- Bi mirov ve dizeliqe; cira wî pir nexweş e.

**Kumê xwe tevî axê daye serê xwe:**
- Her dem ew û hina bi hev diçin.

**Mirîşkên xwe xistine nava hev:**
- Navbera wan xweş e; dostayiya wan pir xweş e; ji hev re weke bira ne.

**Mirov nikare pê re bimeşe:**
- Hevaltiya wî ne xweş e.

**Ne li ser ta û bayê hev in:**
- Fikrê wan ji hev nagire; bi hev nakin; nikarin hevaltiyê bi hev re bikin.

**Pê re nayê derbaskirin:**
- Hevaltiya wî ne xweş e.

**Pê re nayê borandin:**
- Bi heman wateyê.

**Pê re nayê xwarin:**
- Hevaltiya wî ne xweş e; kar pê re nayê kirin; cira wî ne xweş e.

**Qaz û mirîşkên xwe berdane nava hev:**
- Hevaltiya wan xweş e.

**Rûsar e:**
- Civata wî ne xweş e; têkiliyên wî bi mirovan re ne germ in; ne mirovekî civakî ye.

**Tama wî tama tiewê ye:**
- Axaftina wî, civata wî, hevaltiya wî pir xweş e, lê zû diçe em jê têr nabin.
-Tama tiewê (tawî, tiok) pir xweş e, lê kaşilê wê pir hindik e.

**LI SER PESINDARIYÊ**

**Agir axa ye:**
- Ji ber ku ji bo xwegermkirinê mirov li dorê kom dibin wisa tê gotin.

**Aşek dihêra:**
- Pesnên xwe didan.

**Avê li destê wî nake:**
- Weke wî nabe; weke wî ne jîr e; weke wî ne bedew e.

**Badeka hesinî, xwebixwe pesinî:**
- Xwebixwe pesnê xwe dide.

**Baran dibare erd jî pesnê xwe dide:**
- Dema ji yekî re li hev tê pesnê xwe dide.

**Beranê çargurçik e:**
- Wêrek e; aza ye; mêrxas e.

**Binçeng lê werimandin:**
- Pesnê wî pir da; da binê çengên wî; serê wî mezin kir.

**Çavmaminê werin tûyê şêmî:**
- Wisa pesnê xwe nede; tiştên ku tu dibêjî baweriya min pê nayê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî



## Sendîkayên navneteweyî ji bo azadiya Rêber Apo bang kir

Sendîkayên li çar aliyên cîhanê dixebitin, ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan bang kir. Di 10, 11 û 12'ê Îlonê de li bajarê São Jose dos Campos ê Brezîlyayê di civîna Tora Piştevanî û Têkoşînê ya Sendîkayên Navneteweyî de bi daxuyaniyekê daxwaza azadiya Rêber Abdullah Ocalan hat kirin.**R-3**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1100 | 17-Îlon- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# JIN JIYAN AZADÎ

Di ser serhildana Rojhilatê Kurdistanê re salek derbas bû. Dirûşma 'Jin Jiyan Azadî' ya ku li dijî rejîma Îranê bi qetilkirina Jîna Emînî bû çirûska serhildanên li Rojhilatê Kurdistan û Îranê li her dera cîhanê berz bû. 'Jin jiyan azadî li Rojhilata Navîn bû manîfestoya şoreşa jinê'.**R-2**




## Bi ramanê Rêber Apo em ê dawiya şerê taybet bînin



Hevseroka Desteya Jinê ya Rêveberiya Xweser Edalet Omer diyar kir ku dagirkerên tirk rojane êrîşî bakur û rojhilatê sûriyê dike. Herweha bi riya fihoş, madeyên hişbir û koçberiyî û gelek rêbazên şerê taybet yên din jî vê yekê dide maşndin.**R-4**

## Têkçûna DAIŞ'ê Li Kobanê dest pê kir



Nûçegeana ANHA'ê Dicle Ehmed diyar kir ku şikestina DAIŞ'ê ya li Kobanê, bû destpêka têkçûna wê ya li Sûriye û Iraqê û got, çeteyên DAIŞ'ê di 15'ê Îlona 2014'an de li dijî Kobanê êrîşeke berfireh da destpêkinrin, li dijî çekên giran û hêzeke mezin a çeteyan, şervanên YPG û YPJ'ê berxwedaneke bêhempa nîşan dan.**R-5**

**Li Dêrazorê hêza hevgirtina gelan bi ser ket**
Zozan Cizîrî *R-2*

## 'Jinên wêjevan hêviyên siberojê ne'

Bi armanca geşkirina wêjeyê, Dîwana Wêjeya bakur û rojhilatê Sûriyê ji bo jinan koxebatek li bajarê Qamişlo li dar xist, endama rêveberiya Dîwana Wêjeyê Botan Hoşê diyar kir ku armnaca wan pêşxistin û geşkirina wêjeyê ye.**R-7**

DÎWANA WÊJEYÊ
BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYÊ
ديوان الأدب في شمال وشرق سوريا

## Li Şehbayê Xwendekar jî di nava berxwedaniyê de ne

Deriyên dibistanan ji bo destpêkirina sala xwendinê ya nû tên vekirin. Hevserokê desteya perwerdê û hînkirinê ya herêma Efrîn û Şehbayê Fadil Çawîş diyar kir ku dibistanên ku di erdhejê de zirar dîtine hatin sererast kirin. Herwiha têkildarî sîstema xwendinê got:"Îsal ji refa yekem heyanî amedehî sîstema nirxandina asta xwendekaran li ber çavan tê girtin." **R-6**



# Salvegera Şoreşa‘JIN JIYAN AZADÎ’

Di ser serhildana Rojhilatê Kurdistanê re salek derbas bû. Dirûşma ‘Jin Jiyan Azadî’ ya ku li dijî rejîma Îranê bi qetilkirina Jîna Emînî bû çirûska serhildanên li Rojhilatê Kurdistan û Îranê li her dera cîhanê berz bû. ‘Jin jiyan azadî li Rojhilata Navîn bû manîfestoya şoreşa jinê’

**Deriya Çiya\Qamişlo**

Jîna Emînî bi nasnav Mehsa Emînî di sala 2000’î de li bajarê Seqez ê yê Rojhilatê Kurdistanê, di nav Malbateke Kurdperwer û naskirî de ji dayîk bûye. Xwendina xwe heya dîplomê li Seqizê xwend û piştre di azmûnên ji bo çûyîna zanîngehê hate pejirandin, û wê li bajarê Urmiyê dest bi xwendina xwe ya bilind bikira. Ji bo cî bicîkirina karên burokrasiyê çû Tehranê, lê li wira ji aliyê rêjîmê ve hat qetilkirin.




**Desteserkirina Jîna Emînî**

Jina Emînî di 23’ê Îlona 2022’an de li bajarê Urmiyê ku 220 kîlometre dûrî Seqizê ye, cihê xwendinê wergirt. Ji bo qeydkirinê, ew bi dê û birayê xwe re çû wir. Bav û birayê wê dixwestin ku bûtîka xwe li Seqezê bidomînin. Piştî qeydkirinê, ji bo ku betlaneya xwe ya mayî derbas bike, çûn Chalusa li ser Deryaya Xezerê. Paşê malbat ji bo serdana xizmên din û gera bajêr çûn Tehranê. Roja 13’ê Îlona 2022’an piştî nîvro, Jîna Emînî, birayê xwe û du pismamên xwe li navenda bajêr li ser rêya Pira Tabîat, cihê geştyarî li Tehranê bûn. Di yek ji wêneyên dawîn ên Jîna Emînî de, ku berî girtina wê li metroyê hatî kişandin, wê kepek reş û spî û çarşefeke reş li xwe kiribû û tenê çend têlên por lê dihatin xuyakirin. Tenê piştî demeke kurt ew ji aliyê polîsên exlaq yên rêjîma Îranê ve hat işkencekirin û girtin. Birayê wê Kiyaraş destnîşan kir ku wî ji hundir qêrîn bihîstiye û ji polîsan pirsî ka çi diqewime, bersiv nedan. Dema ambulans hat, derew li wan kirin û gotin ku divê efserekî birîndar biçe nexweşxaneyê. Tenê girtiyên din jê re piştrast kirin ku kesê ku hatiye sewqkirin xwişka wî ye. Piştre Nexweşxaneya Kasrayê ji xizmên wê re got ku ew di komayê de ye û dibe ku qet şiyar nebe.

Hevjîna girtiyê ku di heman otobusa polîsan de tê sewqkirin nerazîbûnên li ser otobusê û lêdana Jîna Emînî piştrast kir. Girtiyek din jî ji malbatê re got ku Jîna Emînî dema ku otobusê diçû qereqolê rastî îşkence û heqaretan hatiye. Ji ber vê yekê dê û bavê wê yên ku beriya mirina wê rakirin nexweşxaneyê û hemû xizmên ku bi wan re hevdîtin pêk hatiye, di wê baweriyê de bûn ku ew bi tundî hatiye kuştin.

**Wefata Jîna Emînî**

Jîna Emînî, di 16’ê îlona 2022’an de piştî sê rojan ji desteserkirina wê li Nexweşxaneya Kasrayê jiyana xwe ji dest da. Hejmarek bijîjkan li ser bingehê nîşaneyên klînîkî ku di nav de xwînrijîna ji guh û birînên ku di bin çavan de heye ragihandin ku birînek mêjî ya Jîna Emînî hebû. Tomografiya serê wê ku aliyê hacktivîstan ve ji komputerên nexweşxaneyê hatine derxistin, şikestinek hestî ya ser, hemorrajî û edema (perç) mejî nîşan dide. Herwiha bavê wê Emcet Emînî diyar kiriye ku di dema merasîmê keça wî de, tenê rû û lingên keça wî nîşanê wî dane. Destûra ku li laşê Jîna binêrin ka şopên birînan heye yan na, nedane malbata wê. Bavê wê di axaftina xwe de tîne ziman ku li ling û rûyê Jîna Emînî birîn hebûn. Dema bavê wê ji nojdaran pirsa birînên ling û rûyê wê dike, bersiva “emê lê binêrin we agahdar bikin” hildide. Heta niha rapora sedemên birînên li laşê Jîna Emînî ji aliyê rayedarên Îranê ve bi malbata wê re nehatiye parvekirin.

**Îdiyayên rejîma Îranî ji bo veşartina rastiyê**

Di 15ê Îlona 2022an de xizmên Jîna Emînî piştî lêdana wê di girtîgehê de çalakvanên mafên mirovan ên Kurd-Îranî ji koma wê agahdar kirin .Di heman rojê de, malbatê gotegotên li ser Înternetê red kir ku jîna berê miriye.

Dûv re di 15ê Îlonê, 2022 de, nexweşxaneyê Jîna Amînî “mirê mêjî” ragihand. Paşê xizmên wê ji medyayên kurdî-îranî re şahidî kirin ku Jîna saxlem e û berê tu nexweşiyek wî tunebû. Malpera Kurdî Kurdpa wêneyek Jîna Emînî ya bêhiş di nav nivînên nexweşxaneyê de belav kiriye. Paşê ajanên rejîmê û polîs nexweşxane dagir kirin, hemû wêne û hevpeyivîn ji xizmên wê re qedexe kirin, û zanyariyên nerast û nakok derbarê sedema mirina Emînî bi rêya medyaya fermî ya Fars Newsê belav kirin. Di raporа polîsan de hat îdîakirin ku wê yekser rakirin nexweşxaneyê; Li wir têkçûna dilê wê hat dîtin. Li gor versiyonên din, wê li qereqolê krîza dil derbas kir.

Di 16ê Îlona 2022an de, medyaya dewleta Îranê vîdyoya çavdêriyê ji navenda polîsê Vozava bêyî mohra demê belav kir. Wê hilweşîna Jina Amînî nîşan da, lê ne ya ku berî wê bû. Polîs qeydên bûyerên di otobusa polîsan de belav nekir. Rayedarên Îranê îdiaya xwe li ser vîdeoyê ava kirin ku Emînî ji ber kêmbûna oksîjena mêjî di encama nexweşiyek berê de mir. Ji wê demê û pê ve, nûçeyên berfireh ên medyayê li ser çûna Jîna Emînî ji bo Teheranê, girtina wê bi tundî ji ber binpêkirina rêgezên hicabê, “dersa perwerdehiyê” ya polîsên exlaqî û îfadeyên şahidan ên der barê lêdanên di girtîgehê de derketin holê. Kuştina Jîna Emînî niha bala navneteweyî kişandiye û wekî encama kampanyaya rêjîmê ya li dijî mafên jinan li Îranê tê dîtin. Serokomarê Îranê Îbrahîm Raîsî di 12ê Tîrmeha 2022’an de “Roja Hicab û Efadeyê” ya neteweyî îlan kir û di 15’ê Tebaxa 2022’an de ferman da ku ji sala 1979’an û vir ve qanûnên cilûbergên jinan bi tundî werin sepandin û binpêkerên, cemawerî tundtir werin cezakirin. Ji wê demê ve, gelek jinên Îranî li seranserî welat hatin girtin, hinek hatin îşkencekirin û neçar kirin ku lêborîna giştî bixwazin.

**Bingeha ‘Jin, jiyan, azadî’**

Di dîroka gelê kurd de peyva jiyan û jin yek e. Lê a niha em dibînin ku bûne du peyvên dijberî hev. Em dixwazin vê cudahiya di navbera wan de ji holê rakin. Em êdî jin û jiyanê dîsa bikin yek. Piştî ku hêzên dewleta Îranê Jîna Emînî qetil kirin, di xwepêşandanan de slogana ‘Jin, jiyan, azadî’ derkete pêş. Bi carekê ve li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê ev slogan belavî gelek parzemînên dinyayê bû. Ev di têkoşîna azadiya jinan a sedsala 21’emîn bû şîfreya şoreşa jinên têdikoşin.

‘Jin, jiyan, azadî’ ne bi tenê berxwedan, di heman demê de tê wateya îrade, hêz û rêxistiniya avakirina pergaleke nû. Bêguman mîmarê ‘Jin, jiyan, azadî’ jî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e. Wî di nirxandin û analîzên xwe de yên ji dawiya salên 1980’an de heta îro, bal kişand ser vî tiştî ku li Kurdistanê ev her du peyv koka wan yek e û azadbûna jiyanê tê wateya azadbûna jinan.

**Li seranserê welat li dijî rejîmê xwepêşandan tên lidarxistin**

Ev saleke li seransî Îran’ê û tevahê cîhanê dirûşmeya ‘Mirin ji dîktator re’ tê bihîstin. Kuştina keça Kurd Jîna Emînî ya bi destê polîsên exlaqî ne tenê li Rojhilatê Kurdistan’ê lê belê li seranserî cîhanî bû sedema hêrsa gel û rê li pêleke xwepêşandan û protestoyan vekir. Li gelek bajaran jinan bi şewtandina hicab û qutkirina porên xwe xwepêşandanan dikin û hertim dirûşmeya, Jin jiyan Azadî tê berz kirine. Li hember xwepêşandanan jî hêzên ewlekariyê yên Komara Îslamî bi tundî bersiv didin. Hin dîmenên ser torên medyayî nîşan didin, ku polîs rasterast gulle berdidin ser xwepêşandêran. Li gorî rêxistina mafên mirovan herî kêm 23’ zarok ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatine kuştin. Ajansa Nûçeyan a Çalakvanên Mafên Mirovan (HRANA), ku navenda wê li Amerîkayê ye, di 20’ê cotmehê de diyar kiribû ku di xwepêşandanan de bi giştî 240 kes mirine. Koma çalakvan di heman rojê de got ku ji dema mirina Emînî zêdetirî 12,000 kes hatine girtin. Di 21ê Îlonê de jî hikûmeta Îranê beşeke mezin ji înternetê qut kir. Mînakî Instagram û WhatsApp asteng kirin.

## Ramangeh

### Li Dêrazorê hêza hevgirtina gelan bi ser ket

**Zozan Cizîrî**

Hêzên QSD’ê yên ji pêkhateyên Kurd, Ereb, Sûryan pêk tê, roja 27’ê Tebaxê li herêma Dêrazorê operasyona “Xurtkirina Ewlehiyê” li hemberî şaneyên DAIŞ’ê û bazirganên narkotîkê dane destpêkirin û ev operasyon di nav demek kurt de bi awayek serkeftî gihîşt encamê. Elbet ev operasyon bi pêşdîtin û amadekariyek xurt beriya şaneyên çeteyan bikevin tevgere, hat destpêkirin û hemû planên qirêj ên alozkirina herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê vê carê jî vala derxist. Bi destpêkirina operasyonê re bi awayek balkêş dewleta Tirk a dagirker li dewrûbera Tiltemir û Minbicê çeteyên girêdayî xwe xistin tevgerê û êrîşên xwe berfireh kirin. Rastiya hîn balkêş jî, ragihandina dewleta çete-dagirker a Erdogan lez da makîneya xwe ya derewan û propagandaya “xelkê ereb li hemberî rêveberiya Kurd rabûn” dubare dubare derxistin pêş. Jixwe wezîrê karê derve yê Tirk Hakan Fîdan di wan rojan de wek kordîneya şer li Îranê hevdîtin li ser hevdîtinan dimeşand. Hikûmeta Erdogan a faşîst di vir de jî xwe da dest ku, di nav vê plana alozkirina herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de bi awayek aktîf cih digirin.

Di vê serkeftina QSD’ê de rastiyek pir girîng eşkere bû ku, gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi Kurd, Ereb, Sûryan, Ermen û hemû pêkhateyên xwe hevgirtî ne, ji ber li ser fikra Neteweya Demokratîk zelal bûne, ew guh nadin tu derew û fitneyên hêzên dagirker-desthilatdar. Lewre hemû gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi yek dengî çi di nav çalakiyên wekî meş, daxuyanî de, çi jî di sekna xwe de piştgiriya xwe ya ji bo QSD’ê raber kirin. Bi vê xwepêşandanê eşkere bû ku, li cihê hêza gel a demokratîk bikeve tevgerê, mimkûn nîn e tu lîstikên dijmin û dagirkeran encam bigire. Îro serkeftina gelê Kurd serkeftina gelê Ereb e, serkeftina gelê Ereb jî serkeftina gelê Kurd e. Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê belkî di warê dabînkirina hemû pêwîstiyên civakê de ji ber dorpêça hêzên dagirker û desthilatdar û ferzkirina wan a şer a li ser herêmê derfetên xwe kêm in û di gelek aliyan de kêm dimîne, lê xeta demokrasiyê ya dimeşîne ji bo hemû gelên herêmê hêvî ye, pêşeroj e, esasê hevgirtin û azadiya gelan e.

Ev gava dîrokî ya li Dêrazorê, Minbicê û Tiltemirê jiyan bûyî, nêrînek gelek watedar û ciwan eşkere kir. Di vê herêmê de ku wekî nirxê herî bilind ê civakê xwîna bi hezaran keç û xortên Kurd, Ereb, Sûryan di eniyên herî pêş ên parastinê de têkelî hev bûye û bûye çavkaniya bihevbawerbûnê, hevgirtina gelan nîşana serkeftina demokrasiyê ye. Li cihê demokrasî hebe, her çendî hêzên dijmin û dagirker rojane planên qirêj, hewldanên fitneyê bixin meriyetê jî, her tim mehkûmê têkçûnê ne. Îro tu hêzeke desthilatdar bi qasî hêza demokratîk a civakê nikare ji pêwîstiyên civakê re bibe bersiv. Jixwe armanceke hêzên desthilatdar hebe, ew jî desthilatbûn, kedxwarî, dagirkerî, şer û xwînrijandin e. Lê hêzên gel ên demokratîk temînata aramî, xweşhalî û jiyana azad a civakê ne.



# Navenda Hêzil roleke girîng di parastina çand û hunera Kurdî de list

Reveberê Navenda Hêzil Mehmûd Osman diyar kir ku çalakî û xebatên hunerî yên navenda Hêzil vedgerin salên 80’î, herwiha da zanîn ku armanca wan ya sereke bilindkirina asta çandî û hunerî ya gelên navçeya Tirbespiyê ye.

**Hemza Sêvo/Qamişlo**

Navenda Hêzil ya Çand û Hunerê ya navçeya Tirbespiyê yek ji saziyên hunerî û çandî ye. Ev navend beriya Şoreşa 19’ê Tîrmehê weke komeke hunerî bû û bi navê koma Hêzil di sala 1987’an de hate damezrandin.

Di sala 2000’an de jî ji ber şehadeta Xebat Dogan ku yek ji damezrînerên vê kumê bû, navê vê komê veguherî Koma Şehîd Xebat.

Piştî destpêkirina Şoreşa Rojava, navendeke taybet ji bo çand û hunerê hat damezrandin. Navenda Hêzil bi awayekî fermî çalakiyên xwe yên hunerî li ser asta navçeya Tirbespiyê da meşandin.

Ev navend jî niha 4 koman di nav xwe de dihewîne; koma Şehîd Xebat, Koma Şehîd Behwer, Koma Şehîd Dilgeş û Koma Şehîd Rêwan. Ji van koman 2 komên zarokan in û 2 yên mezinan in. Herwiha hejmara hijmara xebatkarên navendê dighêje 42 xebatkar.

Ev kom bi hevkariya navendê çalakiyên hunerî û çandî yên weke muzîk, stran û dîlanê li navçeya Tirbespiyê li dar dixin. Herwiha hemû kom û xebatkarên navendê hertim hewl didin ku bi behreya xwe xweşbûneke hunerî ji bo bîner û guhdaran re li navçeya Tirbespiyê pêşkêş bikin.

Di derbarê kar û xebatên Navenda Hêzil ya Çand û Hunerê ya navçeya Tirbespiyê de rêveberiyê wê Mehmûd Osman û endama Koma Şehîd Xebat Yara Usman ji rojnameya me re wiha axivîn.



Mehmûd Osman



Yara Osman

**Kar û xebatên navendê yên destpêkê**

Mehmûd Osman balkişand ser destpêka damezrandina Navenda Çand û Hunerê ya navçeya Tirbespiyê û wiha got: “Çalakiyên çandî û hunerî ku li navçeya Tirbispiyê dihatin lidarxistin, ji aliyê koma Hêzil ve bûn. Hevalê me Şehîd Xebat Dogan û hin hevalên din ev kom bi rê ve dibirin û di sala 1987’an de çalakiyên çandî û hunerî li ser asta navçeya Tirbespiyê li dar dixist. Wan bi derfeteke teknîkî û hejmareke kêm tenê çalakiyên hunerî di rojên Newrozan û 15’ê Tebaxê de li dar dixistin. Sedem ji vê yekê jî siyaseta hikumeta Sûriyê ya desthilatdar bû. Her tiştê ku têkildarî gelê kurd bûna qedexe dikir û kesên eleqedar dixist zindanan. Lewma wan xwe bi awayekî veşartî fêrî muzîk, sitran, dîlan û şano dikirin. Piştre jî şano, dîlan, sitran û hwd di çalakiyên xwe de pêşkêş dikrin. Raste me di wê demê de gelek astengî didîtin, lê me bi rumetdarî û xweşbûneke bêhempa hîz dikir. “

**Çalakiyên Navenda Hêzil yên hemdemî**

Osman di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Bi destpêkirina Şoreşa 19’ê Tîrmehê re li Rojavayê Kurdistanê rewşa gelê kurd ji dema berê baştir bû. Êdî vî gelî derfeta xwe ya xebatkatriyê di hemû warên jiyanê de dît. Rewşa çalakiyên çandî û hunerî jî ji vê yekê bêpar nema. Me jî weke Navenda Hêzil li navçeya Tirbespiyê xebata xwe zêdetir bi rêxistin kir. Em di dema heyî de xebat û çalakiyên hunerî li ser asta navçeya xwe li dar dixin. Di heman demê de jî çi çalakiyên hunerî yên ku li ser asta herêma Cizîrê tên lidarxistin, komên me tevlî wan çalakiyan dibin. Ev kom jî yên dîlan, muzîk û sitranan in . Herwiha yên ku li ser perwerde û rêxistinbûyîna endamên koman disekinin kesên bispor û zane ne. Me di dema niha de, dest bi çalakiyeke hunerî kiriye, ev çalakî jî şevbuhêrk in. Em weke Navenda Hêzil ji heftiyê şevekê hildibijêrin û derdikevin gundekî ji gundê Tirbespiyê. Em di van şevbuhêrkan de sitranan dibêjin, dîlanê dikin û hwd… û em hertim xebatên wisa ku asta hunerê li pêş bixe, radibin. Di warê Stranbêjiyê de jî Koma Şehîd Xebat amadekariyên xwe ji bo berhemdayîna sitraneke li ser şervanên QSD’ê dikin, koma me awaz û gotinên wê amade kirine û di demeke nêz de wê were bidawîkirin. “

**Astengiyên ku derdikevin pêş çand û hunerê**

Rêveberê Navenda Çand û Hunerê Mehmûd Osman têkildarî astengiyên dema niha de wiha axftina xwe wiha bi dawî kir: “ Em weke xebatkarên navendê hertim hewl didin asta hunerî li navçeya Tirbespiyê bilindtir bikin. Herwiha ji bo hemû bone û rojên netewî amadekar bin. Ji bo vê yekê pêwîstiya me bi hejmareke pir ya zarok, ciwan, jin û mezinan heye. Ev yek jî dibe alîkar bi me re da ku em çalakiyên xwe li pêş bixin. Lê mixabin hejmara kesên ku tevlî komên me dibin, ne weke tê xwestin e. Em di derheqê şanoyê de jî kêm mane, ev yek jî dihêle asta şanoyê lawaz bimîne. Sedem ji tunebûna koma şanoyê ew e ku hejmara kesên xwedî behre kêm in. “

**Xebata endama koma Şehîd Xebat**

Keça Ciwan û endama koma Şehîd Xebat û Şehîd Rêwan, Yara Cemîl Osman ya ji navçeya Tirbespiyê, derbarê xebat xwe ya çandî û hunerî de wiha got: “ Vîn û xwestek ji her mirovekî re hêza wî ya serkeftinê ye. Ji ber vê jî vîn, xwestek û heskirina min ji çand û hunerê ez di sala 2016 hişt ez tevlî xebatên Navenda Hêzil bibim. Êdî mamosteyên hunerî yên vê navendê bi min re bûne alîkar û hin bi hin pêşketin bi min û hevalên min re jî çêbû. Ez di dema niha de di nav koma Şehîd Xebat ya muzîkê de me hem jî xwendina xwe jî berdewam dikim. Di heman demê de cihê xwe di nav koma Şehîd Rêwan ya dîlanê de jî digirim. Ez û endamên me yên di nav van koman de perwerdeya xwe bi awayekî fermî dibin. Li aliyekî din jî pirî caran ez li ser perwerdekirina hevalên xwe disekinim. Niha jî em ji bo fastîvala 6’emîn ya Şehîd Ronahî Bawer ya Dîlanê xwe amade bikin. Ev fastîval wê di 16’ê mehê de li Rimêlanê destpê bike û em ê weke koma Şehî Rêwan jî di vê fastîvalê de beşdar bibin. “

# ‘Jinên wêjevan hêviyên siberojê ne’

**Navenda nûçeyan**

**Bi armanca geşkirina wêjeyê, Dîwana Wêjeya bakur û rojhilatê Sûriyê ji bo jinan koxebatek li bajarê Qamişlo li dar xist, endama rêveberiya Dîwana Wêjeyê Botan Hoşê diyar kir ku armnaca wan pêşxistin û geşkirina wêjeyê ye.**

Bi armanca xurtkirin û geşkirina wêjeyê li bakur û rojhilatê Sûriyê, di sala 2016`an de Dîwana Wêjeyî ya bakur û rojhilatê Sûriyê li bajarê Qamişlo hat damezrandin. Dîwana Wêjeyî di 10’ê Hizêrana 2023’an de bernameyê komxebateke perwrdeyê ji bo jinan ragehand, di 10`ê Tîrmehê de jî ev komxebat hat destpêkirin. Armanca komxebatê ew e ku jinên ciwan ên temenê wan di navbera 15 û 30 salî de ku dixwazin di aliyê wêjeyê de xwe bi pêş bixin, derfet bê pêşkêşkirin. Derbarê komxebata perwerdê ya Dîwana Wêjeyî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, endama Rêveberiya Dîwana Wêjeya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Botan Hoşê ji rojnama me re axivî.



**‘Komxebata perwerdeyê hemû beşê wêjeyê digire dest’**

Botan Hoşê derabrê komxebatê de wiha got: “Armanca sereke a komxebatê geşkirina wêjeyê di milê nivîsandin û şêwazên wê de ye. Ev komxebat li ser 3’ê qonaxan tê birêvebirin, qonaxa yekem û duyem li ser şêwazê nivîsandinê ye, di qonaxa yekem de bêtir tewrî ji aliyê mamosteyên pispor ve tê destgirtin. Herwiha perwerdeya ku em didin, li ser helbes, çîrok, gotar, roman û şanoyê ye. Beşê duyem jî berdewamiya beşê yekeme, ji ber beşê yekem teoriye û beşê duyem jî piratîkî ye, di beşê duyem de jinê ku hazir bûne yan jî perwerdê distînin dikevin warê nivîsê de ku helbestekê, çîrokek û romanekê binvîsînin. Ji xwe di qonaxa seyem de jî, bêhtir wan berhemê ku hatine nivîsandin û kar zêdetir li ser hatiye kirin, yan jî ji aliyê mamosteyan ve hatine hilbijartin, nivîsên bedew em dikin wek pirtûkekê û berhemeke giştî ji jinên ciwan re derdixînin.”

**‘Komxebatê qonaxa yekem bidawî kiriye’**

Botan di berdewamiya axaftina wiha got: “Her jinek li gorî derfetê xwe tevlî dibin, carnan li gorî derfetê xwe jî tevlî nabin. Jinên ku tevlî komxebatê bûne ji temen 13 heya 30 salî ne, komxebat bi tevlîbûna 13`e jinên ji bajarê Hesekê, Amûdê û Qamişlo ne dest pê kir. Ji dervî ku jin li navendê kom bibin, herwiha di riya enternêtê re jî têkilî hene, em bêtirî xwe jî di riya wê re berheman dişînin û xwendinê dikin, carnan ji aliyê mamosteyan ve tê pêşinyarkirin ku jin pirtûkan bixwînin ji bo ku zêdetir nivîsa wan xutir bibe. Di nava komxebatê de, astengiyên zêde li pêşiya me derneketine. Tenê zehmetiya heye ku nivîsandina wêjeyê hizireke bêtir jêr divê. Lê jinên ku tevlî xebatê bûne tevlîbûneke wanî xweş heye. Komxebat qonxa xwe ya yekem bidawî kiriye. Niha em di bêhinvedanê de ne, piştî bidawîbûna bêhnvedanê em ê tevlî qonxa duyem bibin.”

**‘Wêjevanên biçûk afrînerê pêşerojê ne’**

Endama Rêveberiya Dîwana Wêjeya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Botan Hoşê axaftina xwe wiha qedand: “Ev komxebat tenê li bajarê Qamişlo hatiye li dar xistin, ji ber me dixwest nasbikin ka wê heta çi astê karibe dewam bike. Piştî bidawîbûna bajarê Qamişlo li hemû bajarên bakur û rojhilatê Sûriyê wê komxebatên bi vî rengê bên lidarxistin. Herwiha di vê komxebatê de tevlîbûneke baş hebû. Heta dema ku li bajarê Qamişlo hat ragihandin bajarên din jî xwestin ku komxebateke bi vê rengî li cem wan çêbibe. Armanca me ji komxebatê ew e ku em karibin nivîsandin yan xwendina wêjeyê bi nivîskarên biçûk ji bo pêşerojê avabikin, ji ber tevlîbûna jinan di aliyê wêjeyê de kême. Komxebat bi zimanê Erebî û kurdî ye, ji her dû aliyan tevlîbûne û ji aliyan mamosteyên pispor tên şopandin. Ji xwe ê ku gelek kêfxweşiya me aniye xwendekarê Zanîngeha Rojava, beşê Wêje û Dîroknasiyê tevlî komxebatê bûne. Hêviyeke mezin bi van jinên ê ku tevlî komxebatê bûne di pêşerojê de bibin nivîskarên mezin ji bo nifşekî baş yê nivisandina wêje biafirînin.”

# Hemahengiya Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hevyazbariya giştî ragihand

Hemahengiya Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji bo sala xwendinê ya 2023-2024’an, di 6`Îlonê de hevyazbariya giştî ragehand, herwiha dest bi tomarkirina xwedekaran kir.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Hemahengiya Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, hevyazbarî hemû fakulte û peymangehên Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, Peymangehen Amadekirina Mamosteyan ên girêdayî Desteya Perwerdeyê û Peymangeha Tenduristiyê ya Desteya Tenduristiyê di nava xwe digir, ragehand.

Derbarê hevyazbariya hemahengiya Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya sala 2023-2024`an, endama Komîteya Hevyazbariyê ya Zanîngeha Rojava Sîham Mihemed ji rojnama me re axivî.



Sîham Mihemed balkişand ser hevyazbariya zanîngehên bakur û rojhilatê Sûriyê ya Îasal û wiha got: “Hevyazbariya îsal ji ya sala borî cuda ye, îsal ezmûn ji hin beşên zanistî re hene, sedema wê jî, ji ber ku sala borî ezmûnê tinebûn, hin pirsgirêk di rewşa xwendekarên beşên zanistî de derketin. Ji ber wê pêşinyar hat kirin ku di ezmûnan re derbas bibin, da ku xwendekar li gorî asta xwe derbasî zanîngehê bibin. Li aliyekî din , hersal hevyazbariya peymangehên girêdayî desteya perwerdê û desteya tendûristî ne girêdayî hemhangiya zanîngehên bakur û rojhilatê Sûriyê bûn, lê îsal bi giştî di bin siya hemahengiya zanîngehên bakur û rojhilatê Sûriyê de ne.”

**‘32 Fakulte û peymangeh hene‘**

Sîham Mihemed axaftina xwe wiha qedand: “Hijmarê Fakulte û peymangehên hemahengiya zanîngehên bakur û rojhilatê Sûriyê 32` ne. Herwiha navendên tomarkirina hevyazbariyê li ser çar navendên sereke belav dibin; avahiya sereke ya Zanîngeha Rojava li bajarê Qamişlo, avahiya sereke ya Zanîngeha Kobanê li bajarê Kobanê, avahiya sereke ya Zanîngeha Şerq li bajarê Reqa û navenda KPC`ê li Edas li herêma Şehba yê. “

**Qonax û awayên rêveçûna pêşkêşkirina ji hevyazbariyê re:**

- Dema tomarkirina xwendekaran li navendên hevyazbariyê di 6`ê Îlonê dest pê kir û di 16`ê Îlonê de bi dawî dibe.
- Xwendekarên xwesteka wan pêşkêşiya hevyazbariya beşên ku ezmûn ji wan re divê “ Xwendekarên zanistên xwezayî yên rêjeya wan ji sedî 80`ê ye û ber bi jor ve ye” dê li ser navendên ezmûnan bên belavkirin.
- Ezmûn dê bi sîstema otomatîzê ji bo materyalên bîkarî, fîzîk, kîmya, zindînasî di dîroka 20` Îlonê de be.
- Beşên ku ezmûn ji wan re divê ev in: (Zanîngeha Rojava: Fakulteya bijîşkiyê, endazyariya avahîsaziya ekolojîk, endazyariya çandiniyê, endazyariya petrol petrokîmyayê, kompyûter, komînîkasyon, mîkatronîk, biyokîmya. Zanîngeha Şerq: Fakulteya bijîşkiyê, endazyariya çandiniyê. Zanîngeha kobanê: Peymangeha bijîşkî. Desteya Tenduristiyê: Peymangeha tenduristî-bijîşkî.)
- Ragihandina encamên ezmûnan dê di 24` Îlonê de be. Piştî derketina encaman: navendên hevyazbariyê dê pêşwaziya xwendekaran di navbera 26` Îlonê û 2`Cotmehê ji bo tomarkirina xwendekarên xwe 15 xwestek bikin.
- Xwendakarên tev li ezmûna bawernameyên zanistên xwezayî û zanistên civakî, nebûne, dê li gor pileya xwe ya amadeyî bekeloriya bên pijrandin.
- Xwendekarê/a di beşa ku jê re divê nehatibe pijrandin, dê li gor pileya xwe ya amadeyî bekeloriya û xişteya xwestekên xwe bê pijrandin.
- Belavkirina li ser beşan dê li gor xwesteka xwendekar, pîvanên hevyazbariyê û karîna girtina her beşekê ya ji xendekaran re be.
- Korsek perwerdekirinê dê ji bo fakulteya endazyariya avahîsazî û hunerên bedew di navbera 29`Îlonê û 6`Cotmehê de çêbibe.
- Ezmûna hevdîtinê ji bo beşên ku pêwîstî bi hevdîtinê heye, dê di navbera 4` Cotemehê û 6` Cotmehê de çêbibe.
- Tomakirina xwendekaran di beşên ku bi de dest xistine, dê di navbera 9`Cotmehê û 12` Cotmehê de piştî ragihandina encamên dawî be.
- Dewama fermî ya xwendekarên nû dê dîroka 14`Cotmehê de dest pê bike.

# Li Şehbayê Xwendekar jî di nava berxwedaniyê de ne

**Zana Roj/ Şehba**

**Deriyên dibistanan ji bo destpêkirina sala xwendinê ya nû tên vekirin. Hevserokê desteya perwerdê û hînkirinê ya herêma Efrîn û Şehbayê Fadil Çawîş diyar kir ku dibistanên ku di erdhejê de zirar dîtine hatin sererast kirin. Herwiha têkildarî sîstema xwendinê got:”Îsal ji refa yekem heyanî amedehî sîstema nirxandina asta xwendekaran li ber çavan tê girtin.”**

Xwendekar û mamosteyên Efrînê yên ku zêdetirî 5 sala ye li herêma Şehbayê jiyan dikin. Ji tunebûnê hebûn afirandin. Di şert û mercên koçberiyê de û kêm derfetan de careke din bi hezkirina xwendekar û hêviyên mamosteyan sîstema xwendinê hat danîn û gihîşt serkeftinê. Bi nêzîkbûna demsala zivistanê re deriyên dibistanan tên vekirin. Di erdheja ku di 6’ê Sibatê de hatiye rûdan bi xwe re gelek ziyanên madî avakir. Ji ber dibistanên herêma Şehbayê ji bermahiyên şerê ku di herêmê de hatine qewmandin, para dibistanan ji van ziyanan ya herî mezin bû. Desteya perwerdê di nîvê salê de mecbûr man ku ji bona xwendekaran cadiran deynin, ji ber ku dibistanên ku xwendekar têde diman xeteriya hilweşandina wan hebû. Ji lewra di betlaneyê de ev dibistan ji nû ve hatin sererast kirin da ku xwendekar di sala nû de di wan de xwendina xwe berdewam bikin. Li aliyê din dorpêça heyî û zehmetiyên peyda kirina pêdiviyên xwendekaran rê li ber astengiyên mezin vedike. Lê rûxmî van zehmetiyan jî xwendekar û mamoste bi kelecaneke mezin li benda vekirina dibistanan ne.

Girêdayî vekirina sala nû ya xwendinê, amedekariyên ku hatine kirin û pêşwazîkirina xwendekaran, Hevserokê desteya Perwerdê ya herêma Efrîn û Şehba Mamoste Fadil Çawîş ji rojnameya me re axivî.

**Deriyên dibistana tên vekirin**

Mamoste Fadil di destpêka axaftina xwe de anî ziman ku îsal ew ê nêzî 15 hezar xwendekar pêşwazî bikin û wiha got:”Dibistanên herêmê di 3 yê vê mehê de deriyên xwe ji bona kar û xebata mamoste û rêveberên dibistanan vekirin û di 10’ê mehê de wê bi awayekî fermî xwendekaran pêşwazî bikin. Di sala xwendinê ya 2023- 2024 an rêjeya xwendekaran zêdetire û nêzî 15 hezar xwendekar wê derbasî dibistanan bibin”.

**“Dibistanên ku di erdhejê de zirar dîtine hatin çêkirin”**

Fadil di axaftina xwe de bal kişand ser zirarên ku di erdhejê de hatine rûdan û amedekariyên wan di havînê de çawa bûn û wiha pê de çû: “Bi giştî felaketa xwezayî bandor û ziyanên madî û ruhî kir. Ji ber herêm di gelek şerên dijwar re derbas bû, dibistanên ku têne bi kar anîn jî piraniya wan ji ber şerê ku li heremê rûdayî tiştekî wê li ser hev nemaye. Di erdhejê de zirara herî zêde li ser avahiyên dibistanan bû. Ji tirsa ku avahî li ser serê xwendekar û mamosteyan de neyê war weke çareserî me cadir danîn, heyanî sala xwendinê bi dawî bû. Di batlaneyê de me hewil da ku em dibistanên ku zirar dîtine serarast bikin. Niha me amedekarî bi dawî kirine û wê di 10’ê mehê re bi rengekî fermî dibistan werin vekirin.”

**“Dorpêça li ser Şehbayê bandorê li demsala xwendinê dike “**

Fadil diyar kir ku ji ber dorpêça li ser herêmê di aliyê pêdivî û qirtasiyên xwendekaran de ew rastî zehmetiyan hatin û wiha domand: “Herêm ji aliyê hikumeta Şamê ve zêdetirî 2 sala ye di dorpêçê de ye. Dorpêça heyî li ser tavahî aliyên jiyanê bandor dike û jiyan bi zehmetî derbas dibe. Di demsala zivistanê de hikumeta Şamê nahêle ku sotemenî derbas bibe, ev yek jî yekser li ser rewşa xwendekaran bandorê dike. Ji ber di encam de sobe nayên pêxistin. Di aliyê pêdiviyên xwendekaran de peydakirin wek lênûs, pênûs, pirtûk û qirtasiyan de ji ber heman sedemê em di astengiyan re derbas dibin. Di havînê de me bi zehmetî karî hin pêwîstiyan peyda bikin, lê bi giştî hemû pêwîstiyên xwendekaran nehatine peydakirin.”

**“Di sala nû de sîstema nirxandinê hatiye esas girtin”**

Têkildarî sîstema xwendinê li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê mamoste Fadil ev anî ziman: “Sîstema netewa demokratîk a ku wekhevî, azadî û demokrasî esas digire. Bê guman ev yek bûye reng û terzê jiyanê di tavahî Bakur û Rojhilatê Sûriyê de. Berê di sîstema xwendinê de nirxandin û ezmûn hebûn, lê belê di sala nû de tavahî refên perwerdê ji refa 1 heyanî 12 wê sîstema nirxandinê esas were girtin. Tenê hin babetên taybet yên weke zanyarî wê bi ezmûn bin. Ev weke sîstemeke nû li ser asta giştî hatiye pejiranidn, da ku xwendekar di aliyê nirxandinê de rihet be û di piskilojiya ezmûnan de nemîne.”

**“Babetên li ser ola Îslamî û ola Êzîdî wê bên dayîn”**

Hevserokê Desteya Perwerdê û Hînkirinê mamoste Fadil di axaftina xwe de bal kişand ser hebûna babetên olî yên Îslamî û Êzîdî û wiha got: “Di herêma Şehbayê de du olên ku tên esas girtin hene. Ola Îslamî û ola Êzîdî, ji ber girîngiya



hebûna her du olan di sîstema perwerdeyê de. Herweha hate hilbijartin ku her du ol weke babet di dibistanan de werin dayîn. Ji ber wê yekê di havînê de mamosteyan perwerdeyên taybet li ser her du olan wergirtin. Bi taybet mamosteyên ku ola Êzîdî perwerde bidin ji aliyê Yekîtiya Êzîdiyan ve hatin perwerde kirin.”

**“Ji hemû xwendekaran re pêşerojeke bi serkeftî tê hêvî kirin”**

Herî dawî mamoste Fadil ji bo tavahî xwendekar û mamosteyan serkeftin hêvî kir û bi van gotinan axaftina xwe qedand:”Rewşa ku xwendekar û gelê me di herêmê de jiyan dikin, gelek zehmete, di aliyekî de şer û di aliyê din de dorpêç. Lê rûxmî van zehmetiyan jî hêviyên serkeftin û pêşketinê em di cavên zarok û xwendekaran de dibînin. Her çi ji me bê xwestin em ê, bê berdêl bikin û bidin. Ji tavahî xwendekaran re serkeftin û pêşerojeke bi heybet hêvî dikin.”



# Hejmara 19’emîn a Kovara Şermola Derket

Hejmara 19′emîn a Kovara Şermola ya wêjeyî û çandî ku bi zimanê kurdî û erebî tê weşandin, derket.

**Navenda nûçeyan**

Dosyaya vê hejmarê (Nivîsandin û Belgekirina Dîrokê) ye, ji pêşekiya hejmarê: “Nivîsîn û belgekirina dîrokê ji bo gel û neteweyan xwedî girîngiyeke mezin e. Neteweya ku guh nade vê yekê, dê rastiya dîroka wê were çelexwarkirin, piştguhkirin û jibîrkirin û di encamê de dê di devê hêzên dagirkeriyê de bibe pariyekî hêsan. Her wiha ew milet dê rastî qirkirina nijadî û çandî were. Weke mînak, niştecihên resen ên parzemîna Amerîkayê ji hêla dagirkeran ve hatin qirkirin û navê ``Hindiyên çermsor`` li wan hat kirin. Ji ber ku tu mîrateke şênber a nivîskî li ba wan tune bû, kesên ji wan sax man jî, nikarîbûn guhertin û çelexwarkirina ku der heqê dîroka wan de pêk hatiye, biguherin. Ji ber heman sedemê hin gelên Rojhilata Navîn rastî paşguhkirin û çelexwarkirina nasnameyê tên; her wekî gelê kurd. Gelên derdora wan hewl dan koka kurdan bi xwe ve girê bidin da ku wan di nava xwe de bihelînin. Herwiha rojavaya sermayedar bi navê ``rojhilatnasiyê`` şandeyên mizgîndariyê şandin herêmê û wan karîbû gelên xiristiyanî li herêmê ji hev bixin. Ji aliyekî din ve şande hinartin herêmê da ku li cihên dîrokî û şûnwarî venihêrin û di encamê de herêm rastî dizî, şelandin û çelexwarkirineke dîrokî ya bizanebûn ji hêla rojavaya sermayedar ve hat û bi deh hezaran şûnwarên dîrokî ji bo mûzexaneyên xwe veguhestin (dibe ku di cihên nehênî de jî veşartibin). Armanca wê ji vê yekê ew bû ku bi bûyer û tomarên kevin bilîzin û hin teoriyên dîrokî derxînin; her wekî teoriyên girêdayî koka hindo-ewropî ya hin neteweyên resen li herêma Mezopotamyayê.

Li Sûriyeyê jî, li şûna ku serê xwe bi cihêrengiya neteweyî û çandî ya ku ji hezarên salan ve li herêmê haye bilind bike, hewldan di salên borî de hebûn û hê jî hene ku şaristaniya kevin a ku li Sûriye û Iraqê derket, tenê bi nijadekê ve girê bide. Vê yekê hin caran ramanên nedurist û tundrew der heqê gel û pêkhateyên sûrî de peyda kirin.

Piştî guhertinên ku ji sala 2012an ve li herêmên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêk hatin, hevpeymaneke civakî di navbera hemû gel û pêkhateyên herêmê de derket. Tê de jiyana hevbeş, danpêdana bi tevahî çand û zimanên xwecihî yên herêmê û azadiya weşandinê hatin pesendkirin. Tevî atmosfera vekirî li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê lê tu navend an jî saziyeke têkildarî lêkolînên dîrokî, Nivîsandin û Belgekirina Dîrokê tune ne. Bêguman pêwîstiyeke mezin bi navendkirineke wisa heye da ku careke din ji nû ve li dîroka herêmê û gelên wê binihêrin û di encamê de sêwir, nêrîn û ramanên çewt û nedurist çareser û sererast bikin û dîrokeke nû binivîsin lê vê carê bi destê miletên herêmê.….”.

Di hejmara 19’emîn de gelek mijarên wêjeyî û çandî ku ji aliyê bi dehan nivîskarên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, û welatên erebî, hatine nivîsandin, hene.

Hejmara 19’emîn a Kovara Şermola 152 rûpel in, bi kurdî û erebî hatiye çapkirin.

Di beşa kurdî de ev berhem hene:

Pêşek:
- Nivîsandin û Belgekirina Dîrokê.. (Desteya Sernivîskarîyê)




Dosyaya Hejmarê:
- Girîngiya Nivîsandin û Belgekirina Dîroka Kurdî.. (Merwan Berekat)
- Di Jiyana Gelê Kurde de Girîngiya Nivîsandin û Belgekirina Dîrokê.. (Narîn Omer)
- Wêje Bedewiya Dîrokê ye.. (Fehîma Deştan)

Lêkolîn:
- Cizîrî û Welatperwerî -Xelek 1.. (Diyar Bohtî)
- Nirxandina çîroka (Şaîroko) ya Bavê Nazê.. (Aram Hesen)

Pirtûkên Derketî:
- Pirtûkên Derketî.. (Desteya Sernivîskarîyê)

Huner:
-Stran; Dengê Dîroka Kevnar .. (Berçem Hewar)
-Vejîn (Şano) .. (Simko Cûdî)

Çîrok:
- Kilîd.. (Ebas Mûsa)

Helbest:
-Li te digerim.. (Cemîl Xoce)
- Şevek bû û hatin.. (Yasir kobanî)

Serbest:
- Koça dawîna du rewşenbîran.. (Desteya Sernivîskarîyê)

Ciwan û Wêje:
- Çîrokek di nav koma jinan de.. (Sewsen Şêx Bekir)

# Jinên kantona Qamişlo serhildana ‘Jin Jiyan Azadî’ silav kirin

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Bi salvegera yekemîn ya şehadeta Jîna Emînî û serhildana Jin Jiyan Azadî, jinên kantona Qamişlo çalakiyek li dar xistin û tê de serhildana jinan li Rojhilatê Kurdistan û Îranê silv kirin.**



Bi boneya salvegera serhildana Jin Jiyan Azadî, jinên kantona Qamişlo li ber navenda çand û hunerê ya Mihemed Şêxo çalakiyek li dar xistin. Çalakî bi pêşengiya Kongra Star hat li dar xistin û tê de bi 100’an jinên Kantona Qamişlo beşdar bûn.

Di çalakiyî de berdevka Kongra Star a kantona Qamişlo Şaha Xelîl axifî û got: “Di destpêkê de em serhildana Rojhilat a bi durşmeya ‘Jin Jiyan Azadî’ silav dikin. Herwiha bi durşûmeya ‘Jin Jiyan Azadî’ em ê hemû jinên cîhanê yên bindest azad bikin, bi çirûska Jîna Emînî û serhildana keziyan karîbû di nava salekê de, deng bigihîna tevahî cihanê.”

Jina Kurd Jîna Emînî di 16’ê Îlona 2022’yan de bi hinceta ku serê xwe baş girê nedaye, ji aliyê “Polîsên Exlaqê” yên dewleta Îranê ve hatibû qetilkirin. Piştî qetilkirina Jîna Emînî, bi pêşengiya jinan li seranserê Rojhilatê Kurdistanê û Îranê, bi dirûşma “Jin, Jiyan, Azadî” serhildana gel dest pê kiribû.

Bi boneya salvegera yekemîn a qetilkirina Jîna Emînî û serhildanê tevger û rêxistinên jinan ên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê çalakiyan cûr bi cûr li dar dixin.

# Li Rojhilatê Kurdistanê gireva giştî

**Di salvegera qetilkirina Jîna Emînî û Serhildana Jin Jiyan Azadî de, li Rojhilatê Kurdistanê gireva giştî dest pê kir.**

Di ser qetilkirina Jîna Emînî û destpêkirin Serhildana Jin Jiyan Azadî re salek derbaz dibe. Bi boneya salvegera serhildanê îro li seranserê cîhanê çalakî tên lidarxistin.

Li bajar û herêmên Rojhilatê Kurdistanê greva giştî dest pê kir. Esnafan dikanên xwe venekirin û bazar girtî man.


Li bajarên Seqiz, Sine, Dîwander, Merîwan, Bokan, Bane, Kamyaran, Kirmaşan, Urmiye û Mehabadê gireva giştî dest pê kiriye.

Her wiha bi boneya salvegera Serhildana Jin Jiyan Azadî li bajarên Îranê jî hêzên ewlekariyê hatine belavkirin.



# Sendîkayên navneteweyî ji bo azadiya Rêber Apo bang kir

**Navenda nûçeyan**



**Sendîkayên li çar aliyên cîhanê dixebitin, ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan bang kir.**

Di 10, 11 û 12’ê Îlonê de li bajarê São Jose dos Campos ê Brezîlyayê di civîna Tora Piştevanî û Têkoşînê ya Sendîkayên Navneteweyî de bi daxuyaniyekê daxwaza azadiya Rêber Abdullah Ocalan hat kirin. Nûnerên ji çar aliyên cîhanê beşdarî civînê bûn û piştgirî da kampanyaya navneteweyî ya ji bo azadiya Rêber Abdullah Ocalan û bi hezaran girtiyên siyasî yên Kurd ên li Tirkiyeyê.

Daxuyaniya ku di civînê de hat qebûlkirin û ji aliyê endamê Tevgera Sosyalîst a Şoreşger a Brezîlyayê ya Komîteya Hevdîtina Şoreşgeran (CRIR) ve hat pêşniyazkirin, ji aliyê sendîkayên beşdar ve hat îmzekirin.

Di daxuyaniyê de hat ragihandin ku rêxistinên siyasî, civakî û çandî yên Kurdan ji bo azadiya Rêber Abdullah Ocalan di nava kampanyayê de ne û wiha hate gotin: “Kongreya Navneteweyî ya Navendên Karkeran û Sendîkayan li bajarê Sao Paulo yê Brezîlyayê dicivin û ji bo azadiya Abdullah Ocalan ku 24 sal in li Grava Îmraliyê girtiyekê siyasî yê dewleta Tirk e, hevgirtina xwe nîşan dide. Di heman demê de şert û mercên girtîgehê yên êşkencê ku ji aliyê raporên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) û Komîteya Girtina Ber Li Êşkenceyê ya Ewropayê (CPT) ve hatine piştrastkirin şermezar dike.”

